Li her çar perçan PKK û aligirên wê amadekariya dewleteke Apoçî dikin û ji fikirê xwe û pê ve qebûl nakin. Kurd be. nekurd be. eger vî fikirî qebûl bike ew yê rast e. lê egere qebûl neke ew xayîn e. Li cem wan kîjan partiyê. serokî. yan kes. duh çi kirbe û îro çi bike ji bo Kurdistanê nayê ber çavê wan. û bi dîtina wan ne ji bo Kurdiniyê ye. weke asasgirtin. bi yek fikirî û bi yek ramanê dimeşin û bang li hemû Kurdan dikin; werin em bi hev re ji bo Kurdistana mezin kar bikin. dema ku yek were û bixwaze bi hev re kar bikin dibejin kerem bike ha ji te re (GPS) fikirê APO û bimeşe. yan erê yan na. fikirê hevbeş nayê qebûlkirin. Her weha li her çar perçeyan û bi taybet li Başûrê Kurdistanê PDK jî her roj dibeje em ê dewleta Kurdî ragehînin. lê wê jî pala xwe daye kapîtalizmiyê û destê xwe daye hemû dijminên Kurd û Kurdistanê û pişta xwe bi vî awayî girêdide. ew jî ji xwe û pê veqebûl neke dixwaze dewleteke Berzanî ava bike û bi hukmekî malbatî bibe xwedan desthelat û xwedana Kurdistanê. çi Kurdê û dervey yasayên wê tev bigere dibeje dijmin e û metirsî ye ji bo ewlekariya netewî.

Bi vî awayî amadekariya dewleta Kurdî têye kirin. Kurd bûne meşkên li destê dijmina. dijmin bi wan agirê bê xelatî û bêtifaqiyê gur û geş dikin.... Ev hemû berhemê fermana ye. Bi yekîtiyê rêlî ferman û pîlanan tê girtin. Bi yekîtiyê Kurdistan tê avakirin. Bi yekîtiyê sînor radibin... Biji Yekîtî.

Kurda Mûmeya Sedî Ya Sykes- Picot Vemirand

"Ne bi tenê Kurd dizanin Rojeke nû wê hilê, û sînor in nû wê bên danîn, helbet welatên derdorê û bi taybet welatên ku Kurdistan perçe kirinî û bindestî xwe kirine mîna Turkî, û Îran, ew jî dizanin û kar û barê xwe dikin ku dîsan Kurd bimînin bin destê wan"

Mesûd Kaso

Di roja 16ê Gulana 1916an de Mark Sykes yê Inglîzî û François Georges-Picot yê Firensî lihevkirinek li ser parkirina Rojhilata Navîn di navbera welatên xwe de danîn. û bi erêkirina Rosiya. dî yê lihevkirinê de du perçe ji Kurdistanê - ya di bin destê Osmaniyan de - qetandin û ji xwe re bi welatê Ereban ve girêdan.

Di roja sedsaleya Sykes-Picot de. Kurdan protisto li piranya bajarên Kurdistanê kirin û li çend welatê Ewrupa jî. li hin deverên ku protisto bûn. dîlan û şahî jî lidar ketin. belkî ji ber ku Kurd dizanin ev dawiya êş û işkenca wan e. û mizgineki ji azadiya welatê wan re ye. û ji hêleka din ve ji ber ku Kurd her dem stran û dîlanê wan hazir in. çi di şahiyan de û çi di şer de be. Li hevkirina Sykes-Picot tu carî di fikir û ramanên Kurdan de tinebû. her û her Kurdan ji her çar perçan. li her çar perçan şer kiriye. û Simikoyê Şikakî di bira me tevan de tê. dema hat Kurdistana Başûr û di bin ala Meleki Kurdistanî "Şêx Mahmûd Elhafêd" şer kir. û dema nemir Berzanî li Mehabadê rolek giring lîst. û Kurdin Rojava bi sedan pakrwan li Bakur û Başûr danin. îro jî bi sedan Kurdin Bakur li Rojava şer dikin. û her weha pêşmergê Rojava li Başûr şer dikin û Gerêla li Şingalê. û her û her xwesteka me Kurdan yekîtî û rizgarkirina Kurdistanê bû. lê em bixwazin nexwazin sînorên di nav welatan de. em jî birayê me dûr xistin û Kurd kêfxweş in dema ku dibînin ew sînor tu hurmet ji wan re nemaye. û rabûna wan nêzîk bûye. bi taybet navbera Rojavayê Kurdistanê û Başûrê wê. her weha wek hêla Ereba ku ji hêla Daiş hat rahiştin.

Lê mixabin. ne lihevkirina partiyên Kurdistanî. û guftegoyên di navbera wan de ew rêka ku vebibû girtin. û hêz in xwe nakin yek. û partîtiya xwe li pêşiya Kurditiyê datînin. bi sedema vê guftegoyê û perçebûnê. miletê Kurd şerpeze bû. û koçber û perîşan bû. û rê vebû li ber dijminin Kurda ku êrîşî bajar in li ser sînorê xwe bikin. xerab bikin. mestrîn êrîş ya Kobanê. û Şingalê bûn. lê ne yê bi tenê bûn. û wê ne yê dawî bîn. û ji ber neyekitiya partiyan Kurda xerceki buha danî.

Ne bi tenê Kurd dizanin Rojeke nû wê hilê. û sînor in nû wê bên danîn. helbet welatên derdorê û bi taybet welatên ku Kurdistan perçe kirinî û bindestî xwe kirine mîna Turkî. û Îran. ew jî dizanin û kar û barê xwe dikin ku dîsan Kurd bimînin bin destê wan.

Îran Kurdan li Rojhilatî Kurdistan dikuje û sitemkariyê dike û herweha destê xwe berdide Başûr û Rojavayê Kurdistan jî. ûTurkiyê jî ne bi tenê bajarin Kurdan bumbe dike û miletê xwe dikuji. li Rojavayê Kurdistan jî hêzin Opozosyona Erebî ya çekdar bikar tîne û ne bi dizî car caran bixwe jî li bajar û hêz in Kurdan dixin. û dest bi avakirina diwareki bilind di navbera Bakur û Rojavayê Kurdistanê de kiriye. bi hêvî ye ku Kurdan jihev biqetînin û Sykes-Picot nemirînin. lê ew nizanî wê bibe diwarê Berlîn ji Kurdan re. û wê xistina wî bibe sedema yekîtiya Kurdan.

Sê Dagîrker

Ezbenîno gava wêran bi ser mirovan wer dibe, can û giyanên wan pûç û balûle dibin û ji dîwarê hawirdorê direvin. Di cî de çavên xwe li serkirdayetiya xwe digerînin, pêwîstiya wan bi strana rêberan heye.

Bêkes Têlo

Tu weke stêrka nîv vemirî. bimînî nependî. Gava tu çêbû. tu di nav hembêzan de bûyî. lê niha gava tu dimirî. tu bi tenê yî. Hey hawrê mino:

ji te. ji xwe û ji wan dilgiran im. Volqane : Volqan hat û tirs kete bin berfê...erdhej e: Çavên asoyê şeliqî ne. nima berbanga sosinan dibîne. Gava giyan dî paneberiyê de wer dibe. pêrgî asêgeh û avjîniya xeyalê ser deştên hemû azardili dibe. hişê te ba dide. Nima tiştek dilîve di mejî de û tu pûçî pepûkî li hêviya nûqitek av bi dirêjî li benda dimînî. Ew hêviya bêkes weke min bêxwedî nabetile. ji ber ku li ber te ti stêr nemaye ji bilî ew canêşiya ku tu jê hatiye hûnandin. Tu di navbera du dagirker an. nûvejîna Canêşa Xakê a berdewam û peyvan de mayî. Peyvên ku xewnan li ber te vedikin jî bêriya diroka hilwişyayî. ne ezman ezmanê te ma û ne bihar jî te re vebû. Hêji hewara me di zivistana qûrs de xwe radayî hiştiye. Dibe tu têbigihêji bê dagirkirin çawa ye. lê dagirkirina şoran. peyvan hebek bi te zor e birako. Dengvedana wan avgula ramûsanek e ku ti tam nagihê ye. rojnama sorgulên bêriyê ne?.

Zarokekî ji wira dipirse. Erê : ew yekeke jî kul û birînan biçûkê mino...ew hest û raman e. di sîbehan de ji te re dibêje sîbha te bi xêr û dî şevan de kezeba te cegerperiti li ser maseya Koran diveziline. Dihêhle tu her sîbeh rabigihinî ku duwaroj bêjî, Ez ê neêşim:... xaxaxaaa gerek tu bizanîbî ku ev ji poxên şevê ne û bêdengî evîn e ji wan re...ew dengvedan lalan e. Ev tu çima wîsa li min dinêrî? Hebek dî tê ji xemginiyê serxweş bikevî. Bizanibe.. ku ti kes nikare şiniya te bişo ji bilî te..Ticar li benda nemîne. ku firmsikên pêlên deryayê ewê karibe ji te bêriyê bar bike. Ji çerxê re û ji şikestinên wê re bêje. hêji ez xûlamê sûrgunê me. lê newestyame. Ji ber ku fêrî zimanê berxedanê bûme. ku hemû zimanan li ber lal dibin.

Birako: wa hawrê mino.... tu dizanî ku dagiriyeke hew jê aloztir a sisyan li ba min heye? Tu nima li ber min qala navê rêber bilêv bikî. ez ê ji çermê xwe derkevim û ez ê bibim Drakola ha. Ne rêber û ne rêbero û ji xwe Rêberên me li Rojava haho. hahhooo...kî bixwaze nexwaze. tawanbar in di vê kêlik de ku pêwîste lêv û çermê me nezî hev bikin. Ma ew ê çi bibe ger Qubad ji gora xwe rabe û me bike destek? Û ala Mîdya weke zingila namûsê lê bixe. belkî pozê me bişewite. Ma bû çi. tenê bi ser me de sawîra xewê xwe dirêj kiriye....

Ezbenîno gava wêran bi ser mirovan wer dibe. can û giyanên wan pûç û balûle dibin û ji dîwarê hawirdorê direvin. Di cî de çavên xwe li serkirdayetiya xwe digerînin. pêwîstiya wan bi strana rêberan heye.

Hey ez nabêjim xarîzma (karîzma) em vê zanin ku ne birayên me yên mezin û ne neyar rê nedan me em vî ocaxî biafirînin. lê bi kêmanî li ser qada xwe bin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Sefqan Orkêş: Nikarim Terka Amûdê Bikim، Ger Ez Dûrî Wê Dikevim، Bêhna Min Diçike.

- Çaxa ez bûm refa nehan min helbesta bi navê "Amûdê Hêlîna Dilan" nivîsand.
- Arta FM: Eger ez bêjim şûna mala min girtiye dibe ku her kes bawer neke.
- Ez ta refa dehan li ber pez bûm, diya min stran ji dû stranan digot, û min jê digirtin, bêhaydarî ez fêr bûm, min meqam nas kirin.
- Di şoreşa Sûrî de min her şev helbestek dido li gor bûyerên heyî dinivîsand, bi kurdî û erebî, û helbestê min gihiştin ta Humsê.
- Stranê min bûn cihê rêzgirtinê, û hunrmendê dixwest derkeve, stran û helbestê min jê re bûn pîvan.
- Em di warê pirograman de biserketî bûn, û em yekemîn radyo li deverê bûn, 70% ji serkeftinê para Arta fm bû, û 30% para hemû dezgehên deverê bû.

"Ji bo gefan, di roja didwan ji şewata Arta, min stranek ji nav şewatê belav kir. ew ji nameyek bû ji bo berdewankirina hêviyê bû.. rastiya şewatê sedema wê karê Arta yê baş û bi bandor bû li ser civakê. ji hêla me ve heta niha kesin nenaskirî bûn. agir bi radyo xistin. lê piştî lêkolînê ji hêla Asayîşê ve hatine naskirin û ew radestî dadgehê kirine. Arta niha stirana diweşîne heta stodyo amade bibe û rewş zelal bibe".

- Destpêka ku huner û mûzîkê bala Sefqan Orkêş kişand?

Hunerê ji piçûkanî ve bala min kişand. ji ber ku malbata me malbateke hunerî bû. tembûr ne tişteke xerîb bû di jiyana min de. dost û hevalên min yê li dora min hemû huner bikar dianîn. bilûr û tembûrê gelekî bala min dikişand. û tê bîra min ku me tembûr ji tenekeyan çêdikirin. û pişt re dema ku ez bûm refa şeşan. di dibistanê de tê bîra min ku Şeyda tembûrek kirî û dema ku lê dida min ji xwe re lê dinerî. ta ku ez fêrî mûzîkjeniyê bibim.

Tê bîra min dema ku min carekê lê dida. ji nişkave ji min re gotin. "Kuro wa Şeyda hat" wî çaxî ez ji tirsa re çeng bûm û terpîlîm. panekî derbas bûm derî û bi ser tembûrê de ketim erdê. û ew tembûr şikest...; Ez du rojan ji tirsa re li mala kalikê xwe razam. êdî me dûv re li cem hunermend Dawûd Idwanî çaksaz kir.

Piştre Şeyda tembûr firot û me nema tembûr kirî. em ketin komê de û amûrên mûzîkê hemû amûrên komê bûn.û min radihişt çi min karîbû lê bidim. eger tembûr yan jî bilûr ba an jî çi alav ba.

Çaxa ez bûm refa nehan min helbesta bi navê "Amûdê Hêlîna Dilan " nivîsand û awazê çend stranan jî danîn lê dîsa jî min ji keseki re nedigot ez helbestan dinivîsinim jî ber weke fedyekî li gel min çêbûbû.

Piştre min bekeloriya xwend. berî wê jî min peymangeh a çandiniyê li Qamişlo dixwend lê ji ber nerînên xwe ez jê hatim dûrxistin. û ji ber ku têkiliyên min bi helbestê re bi hêz bûn ez dî bekeloriya wêjeyî de biser ketim. min bêtir guhdariya Melayê Cizîrî dikir. û dema ez çûm zaningehê min strana " Xwezî Esmer Min Karîba Bigota Ez Evîndar im" danî. û bi vî rengî stranek li pey stranekê ve.Êdî piştre hunermendên mezin helbest jî me dixwestin weke Gulistan Perwer û gelek hunermendên Bakûr.

"Di pirogramê diyariyan de gelek hene stranan diyarî serokan dikin. ez ji wan re dibêjim hûn diyarî metik û xaltika xwe bikin çêtir e. ji ber haya serok ji te tune ye. û serok ji van diyariya mezintir in".

- Bi gişti te çiqas helbest ji Şeyda re nivîsandine?

Min gelek stran ji Şeyda re nivîsandiye ez karim bêjim ji sedî pêncî min jê re nivîsandiye.

- We çawe riya xwe di hunerê de vekir, çi li gel Sefqan Orkêş ciyawaz hebû ta ket gastîna hunermendên navdar de?.

Em ji malbateke oldar in. Mele ne. û tu çirokê meleyan û hunerê nas dikî. bavê min ev tişt nedidît şerm. lê ji me xwest em neçin zemawend û ahengan. Mehmûd Bavê Mizgîn. xalê min e û gelek stran û awazên wî hene. yek ji wan " Serok Apo bilind Apo". Elî Mensûr ew jî kurê xalê min e. xalê min Hiso li Bilîrê dida. diya min dengê wê gelekî xweş bû. ez ta refa dehan li ber pez bûm. diya min stran ji dû stranan digot. û min jê digirtin. bêhaydarî ez fêr bûm. min meqam nas kirin. hebûna me li Amûdê ku li ser sînorê Tirkî ne. min hunera Tirkî jî nas kir û jiber kir. min li Helebê xwend û hunera Erebî jî jiber kir. û têkiliyên min bi gelek hunermendên Helebî jî re çêbû. têkiliyên bi Nûrî Iskender û Mihemed Osman re jî pir xweş bû.

Min her dem stranê giran hildibijart mina Sebah Fexrî û Nazim Xezalî. ji Tirka min li Arif Sax guhdar dikir. têkiliyên me bi hunermendê Tirkî ê mezin Birahîm Tatlîs jî re çêbû. û bi me re axivî ta ku were vir. lê mixabin ew derb xwar û nema dikaribû. strana "Tu nizanî" got û li ser kenala Vîn jî eşkere kir got ev stran ya me ye.

Şeyda peymangeha mûzîkê xwend. me xwest em xeteke dî bigrin. me Koma Orkêş ava kir. em deh diwazdeh kes bûn. dawî em tenê sê kes man. me hinek pere dan hev û em çûn Helebê li gel Şiyar Agirî û me kasêta xwe tomar kir. û min li zaningehê belav kir û nav û deng pê ket. me sê kasêt derxistin. Dûv re her kesî ji me li halê xwe kasêt tomar kirin. Şeyda di 2004an de "Elboma Xwezî Esmer" derxist. min jî di 2006an de "Nervîn" tomar kir û dûv re Şeyda yeka dî derxist. herweha her kes ji me taybetmendiyek me çêbû. lê di heman demê de me alîkariya hev dikir.

"Pîşeşaziya me hiştiye em ta niha bêlayen bimînin. em her dem hewl didin di karê ragihandinê de bar û pirisyariyê ji ser xwe ranehêjin. em her dem dixin histê xwediyê mijarê yan nûçeyê de. Em bê daxuyanî tiştekî ranagihînin".

- Wek helbestvan awazjen jî em dixwazin li ser ezmûna te baxivin?

Ez 10-12 salî bûm. min ew helbest ji xwe re nivîsand. û min awaz jê re danî. dûv re min dî refa 11an de helbesta "Kerwanî dor xeleka çavê te dikin meş ta bigêjin tewafa her du kevirê reş" nivîsand û awaz kir. dema min nêşî Şeyda kir. kêfa wî hat. û dema me tomar kir tu kesî bawer nekir ku ev ya min e. min wê demê Melayê Cizîrî pir dixwend. îca min helbest dinivîsand û min dida Şeyda û min nedigot ya min e. min malikek jê re dixwend eger digot xweş e min berdewam dikir. yan jî eger bigota ne xweş e. min temam nedikir û min digot ya xortekî ye.

Di şoreşa Sûrî de min her şev helbestek dido li gor bûyerên heyî dinivîsand. bi kurdî û erebî. û helbestê min gihiştin ta Humsê.

Stranê min bûn cihê rêzgirtinê. û hunrmendê dixwest derkeve. stran û helbestê min jê re bûn pîvan. Di vir de gelek hunermend û dengbêj hatin gel min û min gelek helbest dan û xwediyê wan pê re navdar bûn.

- Destpêka we bi Koma Orkêş re bû. û we baş ew kom navdar kirbû. çima koma we herifî?

kom bê pilan herifî. îroj ma-moste Dijwar Naso mêvanê min bû û me behsa Orkêş hindekî kir. lê xuyaye di jiyanê de tiştek ji tiştekî ferztir heye. û dîsan em amade ne ku em rojekê li hev vegerin û bi hev re kar bikin. ew jî li ser derfetan dimîne.

- Wek hunermend û helbestvan we çi ji şoreşa gelê Sûriyê û ya gelê Kurd re pêşkêş kir?

Dema ku şoreş pêket ez li Mosko bûm. em bistê mehê li Sûrî bûn. tev ku me karî bû venegerin. me ji şoreşê re. jî yekitiyê re. ji biratiyê re stra. Me ew strana "Te malê me gelek xwar lo lo lo lo " tomar kir. û gelek ji strana xelkê digot yên Îmadê Kakilo ne. lê ne ew bû. me bi dengê xwe tomar dikir û me hindekî bi deng dilîzt. Roja ku her du encumen bûn yek me strana "Diya bajara Amûdê" derxist. Û di pêşandanê de jî hat weşandin. Wê demê studyo dî xizmeta gişan de bû. tenê min jî wan re digot Motorê xwe û benzîna xwe bînin û îşê wê pê tune.

- Em li ser berhemên te biaxivin CD. stran û kilîbên ku we derxistine?

ez 13 salan di koma Agirî de mam. ta sala 1996an. ez di hemû kasêtên komê beşdar bûm. dûv kasêta koma Biratî me derxist. û ji xwe piştre se sê kasêtê koma Orkêş bûn. û li dûv re min kasêt a xwe ya bi navê "Nervîn" derxist. piştre min kasêtek bi tenê "Rûniştinek Ûdê" ew jî bi tena xwe ji ber tunebûnê min derxist. ya dawî heşt stran min dî şoreşê de tomar kirin. ew jî di kombuterê de bûn Veyrûs lêxist hemû wenda bûn. dawîca min stranên teka teka dor deh stranan daxistin. serê sedî not ji wan helbest û awazên min in. Şeyda jî awaz dane min. û du stran hene Memo Seyda helbest û awaz dane min. min stranek Ferhadê Içmo jî bi Şeyda re gotiye. lê vê dawiyê têkiliyê min bi mamoste Ferhad re xurt bûn û min derdora 9-10 stranan jê re awaz kirin û gotin mîna "Kobanî bû bûk – Bijî bijî Kurdistan- Şervan im ez şervan im".

- We ji kîjan hunrmendî ê. re helbest û awaz çêkirine?

Min ji gelek hunermendan re daniye. mina hunermend Zoya. Gulistan. Evîna Welat. Newal. Hêvî Hesekê. Hêvî Qamişlo. û strana şehîd Helebçe ku ji gotinên bavê wê Taha Xelîl in min da hunermend Jîyan û bû kîlîp jî. bi rastî niha ev tenê têne bîra min.

- Tê gotin ku Sefqan ji bo Şeyda navdar bibe. ew wek hunermend li paş ma?

Bi rastî Şeyda bi Sefqan ba yan bê Sefqan ba wê navdar bûba. lê pir giring e ku dostaniyek di navbera ê helbestvan û awazdaner de hebe. îca ê me biratî ye. lewre min bêtir dikarîbû jê re binivisanda. ji ber ez pir nêzik wî bûm.

- Em dixwazin li ser ezmûna te di ragihandinê de baxivin, çawe te berê xwe da gastîna ragihandinê?

Kezeba min li ser pirogramên Ereban mina "The Voic – Arab Idol" dîşewitî. min dixwest ez di komitê de bim. û çi cara ku pirogram derdiket min jî xeleka yekê de digot wê ev biser bikeve. yan wê ev bibin bikeve. û wek min digot her dem dibû. Ez jî ragihandinê hez dikim. lê hez nakim xwe bi temamî jê re vala bikim. ez xwe wek rojnamevan di warê ragihandinê de nabînim. û ev yek bi min re nayê daqurtandin jî. lewre hemû pirogramê ku ez pêşkêş dikim têkiliya wan bi hunerê re heye mîna " Vedenga Hunermenda – Behremendên me – şevbuhêrka hunerê – Kilasikên me – Diyariya stranan" û ez her roj jî di pirogramê xwe de distrêm jî.

- Hunermend Sefqan çawa derbas bû dezgeha Arta?

Jî berê de ez û Sîrwan dost in. sala pêşî jî şoreşê têkilî bi min re kirin û got em dixwazin Radyoyekê vekin. radyoyek ne Kurdî lê xurtî. lê wê jî bo xelkê deverê be. jî ber dî wê demê de jî gelek tevlihevî hebû. xwesteka berdanheva xelkê deverê hebû. kêfa min jî hat. min xwest beşdariyê dî vî tiştî de bikim. ev agirê ku tê xwestin gur bibe em vemrînin. me bi hev re destpê kir wek berpirsê beşê hunerî. dûv re ez bûm rêvebirê ofisa Amûdê. û ji xwe îsal ez bûm birêvebirê cibicîkirinê ji bo radyoya Arta.

- We çi astengî dî destpêka karê xwe dî ragihandinê de dit?

Helbet me astengî dîtin. jî ber tu kesî ji me ragihandin nexwendiye. astengî bêtir ji derve bûn jî ber xelkê bajêr Tîrm (Mustelehat) qebûl nedikirin. weşana me bi Erebî. Kurdî.û Suryanî bû. cemaweran digot ev radyo Kurdî ye û divê weşan tenê bi Kurdî be. jî bilî wilo jî ji hêla tekniki û eletirîk û tunebûna sûtemeniyê. em diketin hev de. û mecbûr dibûn afirandinê bikin. Lê niha guman dikim ku 99% jî guhdaran ji siyaset û xeta me razî ne.

- Hun wek rêvebirê Radyoya Arta Fm tên naskirin. gelo dî yê şoreşê de wek karê we dî hermên kurdî de. we çi pêşxistiye?

Bi rastî karê me dî Arta de kareki hevbeş û bi şêwir e. tu carî pêşketina û paşketina kar bi kesayetan ve nayê girêdan. em hev temam dikin. di heman demê de şêwirdarên me jî hene ku xwedî ezmûn in. mezintirîn û kevintirîn kesên ku dî vî warî de kar dikin. her carê mehek yan dudwan xwe jî m re vala dikin. rê pêş me dikin û şîreta jî li me dikin. Bawer bik parastin xet û rêbazê karê herî giring û westan e. û dikaribû ev yek kiriba.

- Radyoya Arta navdartirîn Radyo ye dî heremên Kurdî de. we çi proje amade kiribû. ji bo hun bigihin vê astê?

Em dî warê pirograman de biserketî bûn. û em yekemîn radyo li deverê bûn. 70% jî serkeftinê para Arta bû û 30% para hemû dezgehên deverê bû.

- Dî nerîna te de sedema vê serkeftinê çi ye?

Sedema yekemîn jî serkeftina me hevgirtina me û pîşesaziya me dî kar de ye. ya dî. em tu car jî serê xwe kar nakin. em li şîretan guhdarî dikin. û em li gor rewşa xwe karê xwe dişopînin.

- Hûn dikarin eşkere bikin ku çi cih yan rêxistin alîkariya Radyoya we dikin?

Alîkarî dî destpêkê de jî wezareta karê derve a Swêdî bû. û niha jî ya Emrîkî ye. beşê saziyên civaka sivîl. û herweha saziya Kiryêtiv jî alîkariyê bi me re dike.

-Hûn tewanbar dibin ku mûçeyên bilind jî we re tên û hun mûçeyên kêm didin endamên xwe?

Tiştek heye navê wê girêbest yan lihevkirin di navbera karmend û rêveberiyê de heye. û guman dikim Emrîkî jî wisa zîrektir in. eger gazindeyek wisa hebe tekez wê doza belgeyan bikin. û wê pirisyaran alîkarîkêm kiribana. vajî vê yekê vê rêxistinê radyoya Arta jî xwe re kiriye wek nimûne. û jî hemû radyoyen dî re dibêje wek Arta kar bikin.

- Hun çiqasî dikarin xwe bêlayen bikin ji hin mijar û bûyerên siyasî?

Pîşesaziya me hiştiye em ta niha bêlayen bimînin. em her dem hewl didin di karê ragihandinê de bar û pirisyariyê ji ser xwe ranehêjin. em her dem dixin histê xwediyê mijarê yan nûçeyê de. Em bê daxuyanî tiştekî ranagihînin.

- Di karê we de çi xêza sor e. û çi çênabe ku hun lê ser baxivin. û gengeşe bikin?

Xêza herî sor di karê me de êşandina civakê ye. em her dem li hêla civakê ne. em dûrî êşandina simbolên civakê dirin.

- Di pirograma te de çi te aciz dike. û çe te kêfxweş û geşbîn dike?

Carnan eger mêvanin min hebin. hindek bi riya telefonê diaxivin û tiştin şexsî di navbera wî û mêvan de hene. dixwazin safî bikin. ev yek min dixe helwesteke nexweş de. ez pir pê aciz dibim. dixwazim jî van kesan re bêjim nakokiyên kesayetî ne li ser radyoyê çareser dibin. Jî hêleke dî ve di pirogramê diyariyan de gelek hene stranan diyarî serokan dikin. ez jî wan re dibêjim hûn diyarî metik û xaltika xwe bikin çêtir e. ji ber haya serok ji te tune ye. û serok ji van diyariya mezintir in.

- Tê gotin ku navê Sefqan û programê wî hişt ku Arta fm pêş bikeve. û xelk lê guhdar bikin?

Guman dikim di vir de wê tiştek wek danustendinekê di nav her du aliyan de hebe. min da Arta. û Arta jî da min. hunermend li deverê tune ye ku karibe rojê sê saetan derbas bibe malê xelkê û bi wan re bide û bistîne weke min. lê di heman demê de ken û dengê xweş û kêlîkên xweş jî da Arta.

- Hindek peyv hene dixwazim wateya wan lî gel te nas bikim?

Arta FM. Eger ez bêjim şûna mala min girtiye dibe ku her kes bawer neke.

Amûdê. min berê gotiye hêlîna dila ye. Amûdê diya min e. destê min jê nabe.

Huner. penageh e.

Malbat. li ser asta teng ez bi wan ve girêdayî me. her fireh dibe ez nema wan nas dikim. Malbat li gel min rewa zemînê ye.

- Kê Arta şewitand û çima?..

Gello em ê careke dî dengê Sefqan – piştî wan gef û şewatê- di Arta Fm bikin?»

jibogefan. di roja didwan de min stranek ji nav şewatê belav kir. ew jî nameyek bû ji bo berdewamkirina hêviyê bû. rastiya şewatê sedema wê karê Arta yê baş û bi bandor bû li ser civakê. jî hêla me ve heta niha kesin nenaskirî bûn. agir bi radyo xistin. lê piştî lêkolînê ji hêla asayîşê ve hatine naskirin û ew radestî dadgehê kirine. Arta niha stirana diweşîne heta stodyo amade bibe û rewş zelal bibe.

Hevpeyvîn:
Qadir Egîd

Kurdistan û Ferman

Rêyên şaş. Ramanên şaş. Em hiştin li paş.

Dema mirov bixwaze tişteki zanibe divê bipirse û dibe mirov wê pirsê ji xwe bike: Loma divê em ji xwe bipirsin ferman çi ye? Çi bi xwe re tîne û çi li şûn xwe dihêle? Ferman yanî tinekirina ji hemû tişti. Bi xwe re Kîne. xwînê û bêtifaqiyê tîne û van tovalî şûna xwe diçîne û dihêle....

Gelo gelê Kurd yê ku iro Êzidiyann qebûl nake weke Êzidî. ev neqebûlkirin ji ku hat û ev gel ji ku hat?

Gelo. heke li vir em bibêjin Kurdên ne Êzidî ji 74 fermanan afirîn yan bibêjin berhemê 74 fermanan e. em şaş in?

Bersiv. na ye. ji ber hemû ferman û êriş yên hatine ser gelê Êzidî ji ber olê hatine ser. û Êzidiyan her tim li ber xwe daye. serê xwe daye û sira xwe nedaye. ev Kurdên ne Êzidî îro. ev ne Êzidî ne yên ku nikarin hemû tişte xwe ji fermana xelas kin û biparêzin. lê tişte ji wan hatin parastine weke. Ziman. Çand. Keltûr. Hunera xwe û deng û rengê xwe parastine: Lê ola xwe neparastine. nekuneparastî neji destdayîna bi devê şûr û tifinga. û bi ji destdana olê ji ne felitîne. li bin zilm û zordariyê de hatîne teptepandin û lorandin. ji bo qet çavên xwe venekin û li şûna xwe li xwe neftilin û li xwe nenêrin. Zarokên wan ji bi fitwat û ayatên kerb û kînê hatîne perwerdekirin û rêya xwe-înkarkirinê û hevneqebûlkirinê dayne ber. Ev şagirtên wan îro derçûne û netewîtiyê nadin pêş û xwe nabînin deyndarên netewî û ola xwe ya kevnar. lê xwe dibînin mirîd û deyndar yên wê rêya ku dijmin ew danîne ser. loma ji îro Êzidiyan weke bingeha xwe qebûl nakin. ne ku Êzidiyan qebûl nakin. xwe înkar dikin. û xwe qebûl nakin. ji ber heta anha negihiştine wê astê ku karibin mejiyê xwe ji qirêja dijmin bişon û vê rastiyê ji qebûl nakin....

Li vir pirsa ku ji xwe diafire dibeje. Geli Kurdan. eger rast e hûn Kurdistanê dixwazin û hûn zanin Kurdistan li ser bingeha netewî tê avakirin û netewhemû Kurdan di mala Kurdî de digehîne hev. Kurdên (Sinî . Elewî . Êzidî û.....) çima hûn giringiyê bi netewê nadin û bi yekîtî hûn dirba fermanan nagirin?.

Hinek Kurd dibêjin Misilmantî weke çêlê havînê ye pir germe û mirovan dişewitîne: Lê çima ew Kurd naçinbin sihakepîra bapîrê xwe ya xwezayî û di bin de li xwe û xwîşk û birayên xwe nagerin? Ji ber îro ji yên ku xwe dibînin rêber û serwer ên milet rêwiyên wê rêya me behskirî ne. loma rê nadin ku kes here ber neynikê. xwe bibîne ji bo xwe nas neke. Ev yek tinekirina take kesa dûrxistina ji netewî û rastiya wan. tinekirina civakê bi xwe ye. Nexşeyên dî nexşan de .Perçeyên dî perça de. Sayks Pîkoyên lî sayks Pîkwa de. Kurdistan û Ferman bi destê dijmin Perçe kirin û hûrkirina perça bi destê min û te.... Sayks Pîko Kurdistan kire çar perçe û her perçeyek da dev hovekî ji yên ku dinanên xwe li kezeba mirovan tûj dike. Lê ne tenê Kurdistan perçe kir. kezeba Rojhilata Navîn perçe kir. û bi perçekirinê re bihdera felsefe û zanînê belav kir. û ji ne lihevkirina gelên heremê re tewand. lê ji her geli zêdetir Kurdan li ber wê tewandinê re stra. Kurd bi hev re kirin pale û cotarên rez û baxên bêtifaqiyê. perçebûna Kurdan a di mala Kurdî de ne bes bû. ji hev jî hatin cûdakirin û bûne " Weke noka li kevir ketî". bûn " Mîh bi piyê xwe û bizin bi piyê xwe" û " Her kes û emelê xwe".

Li ser vî asasî Kurdan tevger kir. û bûne xwedan part û tevger. Di nav çar perçan de çend peymanên Kurdî hatine dayin?

Gelo peymanên partiyên Kurdan ne hemû kopiyên peymana Sayks Pîko ne di mala Kurdî de?

Gelo herdu cihên bilind yên biriyara Hewlêr û Qendîl nebûyne Sayks û Pîko û Kurdistanê ji bo berjewendiyên xwe û partiyên xwe perçe dikin?

Heke kurmê darê ne jî darê bê dar xerab nabe û heke îro ne jî partiyên Kurdan ba wê Kurdistan di hindirwê xwe de ne perçe ba. Em her tim behsa fermana dikin û bi vê gotinê re em kuştin û rev û talankirinê tînin ber çavên xwe. heke em li rewşa Kurdistanê û tevgera partiyên siyasî yên Kurdî binêrin. çawa bi dijberî û rikmane li himberî hev deyne. ma ji fermanan û pê ve em dikarin çi navî lê bikin. ji xwe ferman û talan û malwêraniya mezin bêtifaqî û neyekrêziya navmala Kurdî ye.

Weke stranekê ketiye ser zimanê Kurdan. her kes jî xwe re dibeje Sayks Pîko Kurdistan kire çar perçe û li ser çar dewletan dabeş kir. Rast e bi vî awayî dibêjin û bê wate. li dûr dinêrin. lê li nêzik nanêrin. li perçeyên di perçan de nanêrin û nabêjin kê perçe perçe kirine ?.

Heke îro Kurd yekbana. yek perçe. yek fikir û dil. yek armanc û dest. nuha li her çar perçan xwedan maf û desthelat bûna. û her tiştê wan li destê wan de bû. wan xwe bi xwe bi rê ve dibir. Heke nuha deriyên sînora di destêwan de ban. mîna deriyê Birahîm Xelîl li nava Bakûr û Başûr û deriyên din. li nava Bakûr û Rojava. Rojava û Başûr. Başûr û Rojhelat . Rojhelat û Bakûr wê çi wateya sînora heba. û wê çi wateya perçeya heba..... Heta perçe jî mejiyê Kurdan ranebin wê têl û sînor hebin.

Helbestvan dibeje. Sînorên li serê me de ji yên dijmin danî mêstir in. Bi tenê ev semede ku em ji her geli bêhêztir in. Dibeje sînorên ku me li nava xwe de danîn ji yên ku dijmin danî mêstir in. bi tenê ev neyekitiya me. me bê hêz dike di cihanê de.

Mendê War

Mînakên herî zelal Şingal û Rojava. li himber dijminê ku bûye tirs û kabûs ji cihanê re keç û xortên Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi canfidayî li ber xwe didin. dest danaynin û axa xwe diparêzin: Li Şingalê jî heman tişt nuha hêzên Kurdî şer dikin li himber dijminê xwînxwar: Lê partiyên Kurdan îro li ber çavên wî dijminî şerê hev dikin û dijminên gelê Kurd ji wan re kefa dikutin. Li nav gund û kolanên Kurdan dijmin cirîda dikin û li aliyê din dost û cînarên Kurda yên bi dev. sînariyoya şerê birakujiya Kurdan hazir dikin. û Kurd jî di mala xwe de ketîne xirecirê. meşq û rahênanan dikin û bi gef û awiran dinana rayî yek dikin. û dibejin em amadekariya dewleta Kurdî dikin. Lê çi amadekariya dikin?

Li her çar perçan PKK û aligirên wê amadekariya dewleteke Apoçî dikin û ji fikirê xwe û pê ve qebûl nakin. Kurd be. nekurd be. eger vî fikirî qebûl bike ew yê rast e. lê egere qebûl neke ew xayîn e. Li cem wan kîjan partiyê. serokî. yan kes. duh çi kirbe û îro çi bike ji bo Kurdistanê nayê ber çavê wan. û bi dîtina wan ne ji bo Kurdiniyê ye. weke asasgirtin. bi yek fikirî û bi yek ramanê dimeşin û bang li hemû Kurdan dikin; werin em bi hev re ji bo Kurdistana mezin kar bikin. dema ku yek were û bixwaze bi hev re kar bikin dibejin kerem bike ha ji te re (GPS) fikirê APO û bimeşe. yan erê yan na. fikirê hevbeş nayê qebûlkirin. Her weha li her çar perçeyan û bi taybet li Başûrê Kurdistanê PDK jî her roj dibeje em ê dewleta Kurdî ragehînin. lê wê jî pala xwe daye kapîtalizmiyê û destê xwe daye hemû dijminên Kurd û Kurdistanê û pişta xwe bi vî awayî girêdide. ew jî ji xwe û pê veqebûl neke dixwaze dewleteke Berzanî ava bike û bi hukmekî malbatî bibe xwedan desthelat û xwedana Kurdistanê. çi Kurdê û dervey yasayên wê tev bigere dibeje dijmin e û metirsî ye ji bo ewlekariya netewî.

Bi vî awayî amadekariya dewleta Kurdî têye kirin. Kurd bûne meşkên li destê dijmina. dijmin bi wan agirê bê xelatî û bêtifaqiyê gur û geş dikin.... Ev hemû berhemê fermana ye. Bi yekîtiyê rêlî ferman û pîlanan tê girtin. Bi yekîtiyê Kurdistan tê avakirin. Bi yekîtiyê sînor radibin... Biji Yekîtî.

Kurda Mûmeya Sedî Ya Sykes- Picot Vemirand

"Ne bi tenê Kurd dizanin Rojeke nû wê hilê, û sînor in nû wê bên danîn, helbet welatên derdorê û bi taybet welatên ku Kurdistan perçe kirinî û bindestî xwe kirine mîna Turkî, û Îran, ew jî dizanin û kar û barê xwe dikin ku dîsan Kurd bimînin bin destê wan"

Mesûd Kaso

Di roja 16ê Gulana 1916an de Mark Sykes yê Inglîzî û François Georges-Picot yê Firensî lihevkirinek li ser parkirina Rojhilata Navîn di navbera welatên xwe de danîn. û bi erêkirina Rosiya. dî yê lihevkirinê de du perçe ji Kurdistanê - ya di bin destê Osmaniyan de - qetandin û ji xwe re bi welatê Ereban ve girêdan.

Di roja sedsaleya Sykes-Picot de. Kurdan protisto li piranya bajarên Kurdistanê kirin û li çend welatê Ewrupa jî. li hin deverên ku protisto bûn. dîlan û şahî jî lidar ketin. belkî ji ber ku Kurd dizanin ev dawiya êş û işkenca wan e. û mizgineki ji azadiya welatê wan re ye. û ji hêleka din ve ji ber ku Kurd her dem stran û dîlanê wan hazir in. çi di şahiyan de û çi di şer de be. Li hevkirina Sykes-Picot tu carî di fikir û ramanên Kurdan de tinebû. her û her Kurdan ji her çar perçan. li her çar perçan şer kiriye. û Simikoyê Şikakî di bira me tevan de tê. dema hat Kurdistana Başûr û di bin ala Meleki Kurdistanî "Şêx Mahmûd Elhafêd" şer kir. û dema nemir Berzanî li Mehabadê rolek giring lîst. û Kurdin Rojava bi sedan pakrwan li Bakur û Başûr danin. îro jî bi sedan Kurdin Bakur li Rojava şer dikin. û her weha pêşmergê Rojava li Başûr şer dikin û Gerêla li Şingalê. û her û her xwesteka me Kurdan yekîtî û rizgarkirina Kurdistanê bû. lê em bixwazin nexwazin sînorên di nav welatan de. em jî birayê me dûr xistin û Kurd kêfxweş in dema ku dibînin ew sînor tu hurmet ji wan re nemaye. û rabûna wan nêzîk bûye. bi taybet navbera Rojavayê Kurdistanê û Başûrê wê. her weha wek hêla Ereba ku ji hêla Daiş hat rahiştin.

Lê mixabin. ne lihevkirina partiyên Kurdistanî. û guftegoyên di navbera wan de ew rêka ku vebibû girtin. û hêz in xwe nakin yek. û partîtiya xwe li pêşiya Kurditiyê datînin. bi sedema vê guftegoyê û perçebûnê. miletê Kurd şerpeze bû. û koçber û perîşan bû. û rê vebû li ber dijminin Kurda ku êrîşî bajar in li ser sînorê xwe bikin. xerab bikin. mestrîn êrîş ya Kobanê. û Şingalê bûn. lê ne yê bi tenê bûn. û wê ne yê dawî bîn. û ji ber neyekitiya partiyan Kurda xerceki buha danî.

Ne bi tenê Kurd dizanin Rojeke nû wê hilê. û sînor in nû wê bên danîn. helbet welatên derdorê û bi taybet welatên ku Kurdistan perçe kirinî û bindestî xwe kirine mîna Turkî. û Îran. ew jî dizanin û kar û barê xwe dikin ku dîsan Kurd bimînin bin destê wan.

Îran Kurdan li Rojhilatî Kurdistan dikuje û sitemkariyê dike û herweha destê xwe berdide Başûr û Rojavayê Kurdistan jî. ûTurkiyê jî ne bi tenê bajarin Kurdan bumbe dike û miletê xwe dikuji. li Rojavayê Kurdistan jî hêzin Opozosyona Erebî ya çekdar bikar tîne û ne bi dizî car caran bixwe jî li bajar û hêz in Kurdan dixin. û dest bi avakirina diwareki bilind di navbera Bakur û Rojavayê Kurdistanê de kiriye. bi hêvî ye ku Kurdan jihev biqetînin û Sykes-Picot nemirînin. lê ew nizanî wê bibe diwarê Berlîn ji Kurdan re. û wê xistina wî bibe sedema yekîtiya Kurdan.

Sê Dagîrker

Ezbenîno gava wêran bi ser mirovan wer dibe, can û giyanên wan pûç û balûle dibin û ji dîwarê hawirdorê direvin. Di cî de çavên xwe li serkirdayetiya xwe digerînin, pêwîstiya wan bi strana rêberan heye.

Bêkes Têlo

Tu weke stêrka nîv vemirî. bimînî nependî. Gava tu çêbû. tu di nav hembêzan de bûyî. lê niha gava tu dimirî. tu bi tenê yî. Hey hawrê mino:

ji te. ji xwe û ji wan dilgiran im. Volqane : Volqan hat û tirs kete bin berfê...erdhej e: Çavên asoyê şeliqî ne. nima berbanga sosinan dibîne. Gava giyan dî paneberiyê de wer dibe. pêrgî asêgeh û avjîniya xeyalê ser deştên hemû azardili dibe. hişê te ba dide. Nima tiştek dilîve di mejî de û tu pûçî pepûkî li hêviya nûqitek av bi dirêjî li benda dimînî. Ew hêviya bêkes weke min bêxwedî nabetile. ji ber ku li ber te ti stêr nemaye ji bilî ew canêşiya ku tu jê hatiye hûnandin. Tu di navbera du dagirker an. nûvejîna Canêşa Xakê a berdewam û peyvan de mayî. Peyvên ku xewnan li ber te vedikin jî bêriya diroka hilwişyayî. ne ezman ezmanê te ma û ne bihar jî te re vebû. Hêji hewara me di zivistana qûrs de xwe radayî hiştiye. Dibe tu têbigihêji bê dagirkirin çawa ye. lê dagirkirina şoran. peyvan hebek bi te zor e birako. Dengvedana wan avgula ramûsanek e ku ti tam nagihê ye. rojnama sorgulên bêriyê ne?.

Zarokekî ji wira dipirse. Erê : ew yekeke jî kul û birînan biçûkê mino...ew hest û raman e. di sîbehan de ji te re dibêje sîbha te bi xêr û dî şevan de kezeba te cegerperiti li ser maseya Koran diveziline. Dihêhle tu her sîbeh rabigihinî ku duwaroj bêjî, Ez ê neêşim:... xaxaxaaa gerek tu bizanîbî ku ev ji poxên şevê ne û bêdengî evîn e ji wan re...ew dengvedan lalan e. Ev tu çima wîsa li min dinêrî? Hebek dî tê ji xemginiyê serxweş bikevî. Bizanibe.. ku ti kes nikare şiniya te bişo ji bilî te..Ticar li benda nemîne. ku firmsikên pêlên deryayê ewê karibe ji te bêriyê bar bike. Ji çerxê re û ji şikestinên wê re bêje. hêji ez xûlamê sûrgunê me. lê newestyame. Ji ber ku fêrî zimanê berxedanê bûme. ku hemû zimanan li ber lal dibin.

Birako: wa hawrê mino.... tu dizanî ku dagiriyeke hew jê aloztir a sisyan li ba min heye? Tu nima li ber min qala navê rêber bilêv bikî. ez ê ji çermê xwe derkevim û ez ê bibim Drakola ha. Ne rêber û ne rêbero û ji xwe Rêberên me li Rojava haho. hahhooo...kî bixwaze nexwaze. tawanbar in di vê kêlik de ku pêwîste lêv û çermê me nezî hev bikin. Ma ew ê çi bibe ger Qubad ji gora xwe rabe û me bike destek? Û ala Mîdya weke zingila namûsê lê bixe. belkî pozê me bişewite. Ma bû çi. tenê bi ser me de sawîra xewê xwe dirêj kiriye....

Ezbenîno gava wêran bi ser mirovan wer dibe. can û giyanên wan pûç û balûle dibin û ji dîwarê hawirdorê direvin. Di cî de çavên xwe li serkirdayetiya xwe digerînin. pêwîstiya wan bi strana rêberan heye.

Hey ez nabêjim xarîzma (karîzma) em vê zanin ku ne birayên me yên mezin û ne neyar rê nedan me em vî ocaxî biafirînin. lê bi kêmanî li ser qada xwe bin.

Helbestin Bijartî ji Dîwanên Dildarê Mîdî

"Navê wî Mihemed kurê Ehmed kurê Mihemed kurê Haco kurê Doşo ye . Di sala 1963 yan de li gundê (Elwankê) hatiye dine, Biçûkê sê xwîşk û du bira ye.

"Kevana Reş. Ken û Girî"

BIRÎN

Birîna min ji ber ez pir dinalim
Evê janê dikuştim pir û kal im
Bi ser hevde guvaştim ez bê halim
Ziwa nabê ji vê xwînê bi carek

Birîna min gelek têşê ji janê
Dikim qêrîn şev û rojê tu zanê
Evîndarê welat im ji (Îmanê)
Ji bo min tu ne be qet dil giranek

Birîn çêbûye çend salin di dil da
Ji kevanan çi tîr avêt li mil da
Kezeb sotî bi ser birîna kul da
Di nav dil min ketî îro çi arek

Ji ber birîna xwe îro çi gêjim

ZÎNÊ

ŞEPAL Û Nêrgiz û Zinê
Qeşeng û naz û şêrînê
Melhema jan û birînê
Enî findê ji ronakê
Were dilber kubarî tû
Memik sêv û hinarî tû
Weke birûsk û arî tû
Di nava cerg û mêlakê
Naz û çiçek û gulnarî
Gulşen û bax û buharî
Weke rojî li êvarî
Ji te ronî didî xakê
Enî lêv heyv û bişkojê
Ji te şeveq didî rojê
Jîna min mek wekû dojê
Li min rehmê tu qey nakê
Sipî zendê gulî zêrê
Mede awir wekû şêrê
Li dil nede rîm û kêrê
Dilavanî bi min dakê
Dev û lêvên te qurmiz bin
Çirîn û qend û hingiv bin
Li ber min ger hemî civ bin
Ezê firkim bi qurtakê

Vexum ger heta êvarî
Ta roj li min bibî tarî
Gej bi germî geh bi sarî
Tîna dilê mi şilnakê

BINÊRIN

Ez çime ez divê jînê ?
Ev çiye jana evînê
Dil tijî bû ji vê xwînê

Ne dîn im ez ne jî bar im
Can û ceger gelek jar e
Hemî kul û xem û ar e
Jana evînê dijwar e
Van xem û derdan ez xwarim
Can û ceger hemî kuştin
Dil û mêlak tev biriştin
Ruh di canê min ne hiştin
Berxim di nav gurên har im
Ji ber jana evîna dil
Dinalî dil ji îş û kul
Ta kû ji xwînê bûye şil
Ji zûde ez evîndar im
Evîndarê welat im ez
Karkerê rojhilat im ez
Ez Dicla û Ferat im ez

"Bavê wî bi zarotî destê xwe ji mam û pismamên xwe birî û gundê Bafê (kevana reş) li pişt xwe hişt û berê xwe da binya xetê û dawî li gundê (Elwanka Şêxê) bi cî bû" .

Kelemê çavê neyar im
Baran û birûsk û ba me
Ristevan im kurd im hêja me
Çakûçê destê Kawa me
Sirtim pola me dijwar im
Ez pîzot û ar pêt im
Nalîna zab û ferêt im
Ez bervedêrê welêt im
Kurd im. Mîdî me. Dildar im .

MEZLÛM DOXAN

Ey heval Mezlûm Doxan
Şehîdê Kurdistanê
Te danî şitleke nû
Di baxê berxwedanê
Ronî bû mêjiwa kurd
Bi te divê cîhanê
Conta gemar û faşist
Te anî l ber yemanê

Di singa conta gemar
Tu bû sindan û kelem
Ew laşê can û nazik
Te da ber ar û seqem
Ji dil xwe te deranî
Jan û êş û kul û xem
Sûnda min bixwîna te
Tu Kawayî di her dem

Tu Kawa û tu restem
Ji bona serxwebûnê
Li hember dijminê pîs
Te kir doza hebûnê
Şewqa xwîna te ya sor
Ronî dîda gerdûnê

Sed carî bijî Mezlûm
Heta roja rabûnê

Ezê kû saxim di jînê
Sûnda min bi serê te
Qesîs nebim bixwînê
Li pêşiya hêzên dijmin
Ezê vegerim kemînê
Bikim li ser rêşa te
Xebat û têkoşînê

Markisizma Lênînî
Ji bo xwe te kir çeper
Di zîndana Amedê
Şanî dijmin da huner
Ne tewandin serê te
Çerx û mewe û pêl û ger
Bijî berxwedana te
Di her çax û li her der

HESENÊ GEMO

HESENÊ Gemo mamê pir hêja
Dostaniya me kevne. ji mêje
Dixwazim herdem jîna te xweş bî
Gula baxê te rengîn û geş bî

Herdem gava go ez te dibînim
Ji bo jîyanê ez bi evînim

Dîmenê tey xweş. pozê mêranî
Nav û dengê te yê Bûbilanî

Serdarê hozê. meger ji Girdî
Dizanim kû tu kaleki kurdî

Tu rêhevalê pîrê Cigerxwîn
Yê kû nav û deng gîha Hind û Çîn



Cerg û dilê xwe herdem wî disot
Ji mere bêje ewî çi digot ?
Yan jî çi dixwest çibû doza wî
Bêje. kî bû diz ketî koza wî ?

"Di sala 1972an de ji gund bar kirin û li bajarê Qamişlokê bi cî bûn, û xwendina ta (bekelorya) li bajarê Qamişlo sitand, pişt re li zanîngeha Şamê beşê toreya Erebî du salan xwend, û mixabin ji ber hin sedeman nebir serî ."

Rastiyê bêje wey apê Hesen
Dilê tey şewat devê te li ken

Peyvek mêranî dermanê derde
Diz tû dibînê bêje li serde

Nûka tû dildar cama xwe hildin
Di şevên tarî ez û te findin

Min û te tev de serê xwe hilda
Bilbilê kurd û dil kulê kurda .

JI BER ÇAVÊ MI NAÇÎ

ji dil min hilm û pêta ar difûrî
Di nava ar hêjî min dil dizûrî
Dike gazî li wan rojên bihûrî
çima yarê ji min dûrî . çi dûrî

çendî dûrbî ji ber çavê mi naçî
sofîbim ger li dor ser şaş û paçî
mesîhî bim li ser singa mi xaçî
ji ber çavan tu naçî qet . tu naçî

ji ber çavê mi naçî ta kû saxim
tu bustanî bilbilim ez di baxim
ji derdê te diçim . têm bê semaxim
ne bînim te mirîme ez kelaxim

ji ber çava hingî herê . di gorim
li ser destan di çardarê li jorim
şehîdim ez tevde ji xwînê sorim
di gorê ji dibînim te ne korim

mirî bim jî tim li ber çavê minî
mêkew bêjî tim tû di davê minî
xurist bim jî tu co û avê minî
Dildarim ez nîşan û navê minî

BRSIVA MIHEMED ELÎ HISO

soz û peymana di dil qet. qet
xuyanabê bi çav
tev bû êş û can mirandî dakete cerg û hinav

her kesê daxwaz kirî ew zû gihane doza dil
wey li halê min tenê bê hîn li paşim ez bigav

qet di destê minde nîne hîç ji bil
xama ziwa
pê di rêjim ez li ser pel peyvê tal û pûç û xav

sed hezar salî temam barên giran ez hilgirim
rûmeta insaniyê nîne nebin zêr û dirav

yek sipas û aferînê na bihîzim ez ji kes
dest li pişt û ser di berde tev di bûrin bê silav

XWÎN BARANE

Baranin li kurdistanê va îro dibarin
Pir xurt û lehîne
Yê kû bi xwazî tov û dendikên xwebiçînê
Ev nirê zêrîne
Da kû bi dil şadî ew xwe pêve bigihîne
Buharê bibîne
Divê ne razê pir şiyarbê bi kar û barbê
Zendan bişidîne
Lata xwe vedî ji kevir û teht û şikêran
Nû tov bireşîne
/simko/ ji bo me bi xurtî rabû çûye qadê
xwînê direjînê
xaka me bi xwîna /simko/ va hatiye avdan
buhara me şîne
buhara bi xwînê her demî kû bête avdan
bahoz na mirîne
zengîne bi xêre vaye bo me diyar bûye
sûdê bo me tîne
sûndê dixum şopa şehîdan qet neyê berdan
rêça me danîne

"Di sala 1983an de dest bi rist û hûnandina helbesta kurdî kir, û pê re di danhev û komkirina folklorê kurdî de jî kiriye, mina: Çîrok, metelok, şertok, stran, listikê zarokan û gotinên pêşiyan mijûl bû.

kes dê nikarî qet bibêjî şehîdê kurdan
herdem bê xwedîne

BIRAYÊ XWE NA KUJIM

Şerme keko fihête
Ev karê te kirête

Ma qey ji kengî ve kurd ?
Bûne peya û zigurd .....

Du pirtûkên helbestan çap kirine ew jî ev in: Kevana reş, Ken û girî. Bi dehan helbestên Dildarê Mîdî bûne stran û hunermendên navdar gotine.

Raste îro siwarî
Bi dijmin re li karî

Lê sibe dora teye
Ma tu bi kêfa xweye ?

Te divê kû birê xwe
Bidê dest dijminê xwe

Bi zane ev dijmine
Yê teye lew yê mine

Eger ew mivn di kujê
Lê xwîna te di mijê

Bes bux goştê birê xav
Çi zû te xwîn kire av

Payabe ji wê tengê
Dest bavêje tivengê

Tu mil bide milê kek
Dest bavêje gurz û çek

Bi kevin nava dijmin
Koka wî rakin ji bin

Bide serê xwe mejî
Şerme birê dikujî

Birayê xwe ne kuje
Dinya moran û mije

GOVENDA AZADÎ

Dilaneke pir xweş li kurdistanê li dare
Saza wê tivenge

Reqs û sema wê bi carekê ne wek semayê
Tev êrîş û cenge

Xemla vê dilanê tev ji rengê xwînê sore
Kû sor gul ji renge

Govenda sitêraye li ser ezmanê xwînê
Ronî û perenge

Yê kû bixwazê zend û pêçên xwe rahejîne
Barabê derenge

Lîlan û şabaş û aferînên xwe tê hildê
Binav û bi denge

Şabaşên dilanê tev ji xwîna lawê kurde
Nîşana lehenge

Her dem di qirim gelî bira werne dilanê
Bi hêza pilenge

Da xweş bibê dilana me deng bighê cîhanê
Dê naskin çi renge

Hin dê ji mere li çepka xin hin bilîlinin
Çuqasî girenge .

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
buyer PRESS
Nûçe... Bi Zelali

Peyva wendayî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	R	B	A	K	U	R	S	R
2	O	I	P	Î	K	O	S	O
3	J	P	A	R	Ç	E	A	J
4	A	S	E	D	T	S	Y	H
5	V	E	S	A	L	Î	K	I
6	A	B	E	S	E	N	I	L
7	S	Î	N	O	R	O	S	A
8	B	A	Ş	Û	R	R	M	T

Sînor, Saykis, Pîko, Rojava, Rojhilat, Bakur, Başûr, Parçe,Bese, Sed, Sal.
Peyva wendayî ji 5 tîpan e: Zulm û zor.

Bersiva Peyva Wendayî 43: Dibistan

Mamik

-Kaloyek tê ji deştê, barê striyan li piştê.
- Çiyayê bê kevir, deryaya bê av , daristana bê dar, bajarê bê mirov.
-Şile ziwa nabe, bê xwê ye genî nabe.

Bersiva Mamiken 43an
Kûsî - Sîya Mirov

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								■
2				■				
3		■			■			
4			■					
5	■				■		■	
6					■			■
7				■		■		
8			■					

Asoyî:

1- Kêzika hecê.
2- Nijadek e, kurtkirina navê Fatima.
3- Dan (dema bûrî), daxwaz.
4- Dîn, filan (Belawela).
5- Pêxemberek e.
6- Navdartirîn qurbaniyên deryaya Îce, bi dawî nebû.
7- Kur, endamekî laş.
8- Ji bo avdanê, cinava hevdûtiyê.

Sitûnî:

1- Paşnavê dengbêjekî navdar, nîşana gelekî.
2- Agir, navekî keçan.
3- Êsîr (vajî), tirs.
4- Navdartirîn qurbaniyên deryaya Îce.
5- Nîvê (afet), wekhev.
6- Zarok bi soranî (vajî).
7- Wêne bi zimanekî din (vajî), nan jê çêdibe.
8- Cureyekî lawiran, wekhev.

Bersiva Xacereza 43an

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	■	N	A	B	A	Y	e	B
2	Z	I	R	A	V	Ê	■	A
3	E	W	A	N	■	Z	Û	■
4	Y	E	M	E	N	■	D	D
5	T	■	Î	Ş	A	B	■	A
6	Û	R	■	A	R	T	Ê	Ş
7	N	A	S	N	A	M	E	■
8	■	N	Î	■	B	I	■	A

Kurdî Xweş e

Kavil	أطلال
Nîvreng	باهت
Nişîv	منحدر
Gelî	أخدود
Neheng	حوت
Nankor	ناكر الجميل
Mirtik	رواسب
Kam	رغبة
Berdar	خصب – غزير
Keysebaz	انتهازي
Nîgar	رسم



Penden Kurdi

-gotna xweŞ buhara dilaye .
-golkê malê ji gayê malê na'tirse
- Goştê ber dirana kesî têr nake.
- Gotinê bav û kalan bi serê xwe ne .
- Gîska gurrî ne ji serê kanyê be venaxwe .
- Li kerekî mirî digere ta nal jê bike .
- Eger li kûçika diqewime ji tajiya bezatir dibin .
- Ji birayê mezin werê birayê biçûk ne mêr e .
- Ji xwe re kor e ji xelkê re jîr e.
- Ji ava xurt metirs, ji ava hêdî bitirs .
ji qîza xwe re bigere ji lawkê xwe re megere .